Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

- Wekî bajarekî Kurdistanî, Herêma Efrînê ji berî sala 2011’ê çawa bû, di hundirê evê herêmê de xelk çawa dijiya û ta çi radeyê ew kirasê kurdewar li bejna Çiyayê Kurmênc dihat?
Her gundek ji gundên Efrînê Kurdistanek tê de heye; ango Kurdistana Mezin tê de heye. Di her gundekî de navên zarokan Amed, Hewlêr, Mehabad, Dicle, Ferat, Sîpan û Zagros hene. Di her gundekî Efrînê de, navê tevahiya xaknîgariya Kurdistanê peyda dibe. Tişta herî balkêş di Efrînê de ew e ku hemî xelk bi kurdî dipeyive. Efrînê kurdewariya xwe parastiye. Efrîn bi hemî awayan bajarekî Kurdistanî ye. Efrîn hêlîna neteweyî ye; di 1957’ê de dema ku yekem partiya siyasî li Rojavayê Kurdistanê ava bû, 4 kes jê ji Efrînê bûn. Bi dehhezaran ji ciwanên Efrînê bawernameyên bilind wergiritine. Belku xwendevanên Efrînê bi qasî yên Bakurê Kurdistanê hebûn. Ji 2006’ê hetanî 2014’ê, tenê li Efrînê me 8400 kes fêrî zimanê kurdî bi 3 astan kirin. Xelkê Efrînê xwendevan e.
- Sala 2011’ê bû destpêka qonaxeke nû ji hemî deverên Rojavayê Kurdistanê re. Di pê sala 2011’ê re Efrînê çi danehev kir û xelkê Efrînê çawa pêşwaziya guhertinên nû kir; ango ta çi radeyê hûn ji vê serdema nû re bûn bersiv?
Efrîn wekî ku hebû xwe parast. Xelkê Efrînê ser hev bû, li dij hev ranebû. Ev jî ji bo pir kesan çavêşiyek bû. Hin guhertin çêbûn; zimanê kurdî derbasî dibistanan bû û tişta herî balkêş ku ji bo me xewn û xeyal bû, vebûna Kulêja Wêjeyê li Efrînê bû. Keça min jî ji sala yekê hetanî ya sêyan lê dixwend.
- Berî ku êrîşa Tirkiyê li ser Efrînê dest pê bibe, tevahiya dunyayê jê hay bû ku êdî êrîş dest pê dibe. Di demekê de ku tang û topên Tirkiyê li hawîrdorê Efrînê dihatin rapêçan, di wan kêliyên dawî de xelkê çi dikir, çi amadekarî dihatin kirin?
Ez li gundewarê Efrîn bûm û hêj ez lê me. Xelkê Efrînê bi şêweyekî giştî ne di wê baweriyê de bû ku rewş bigihe vê rewşa ku aniha em tê de ne. Lê mixabin bû... Bersiva evê pirsê bi hûrgilî di romana min de hatiye.

Her bêjeyeke ku di romanê de hatiye nivîsîn, bi şewata dilê xelkê hatiye nivîsîn; her peyvek êşek e, her tîpek birînek e.

- Êrîş û topbarana Tirkiyê dest pê bû û te jî dest bi nivîsîna romanekê kir. Di demekê de ku hinan kara şervaniyê dikir û hinên din jî kara penaberiyê dikir, te roman nivîsî. Di wan kêliyên zor de, te çawa û ji ber çi ev biryar sitand?
Ez di wê baweriyê de bûm ku hin destane li Efrînê dê dest pê bikin û divê ev destane li ber ba neçin, bi çi şêweyî be divê bêne belgekirin. Roja yekê 20’ê berfanbarê bû, dema ku balafiran derdora gundê me bumbebaran kir, ji dêvla ku xelk bireve hemû derketin ser banên malan da binêrin ka çi heye. Cama mala min bi xwe jî şikest. Êvarê ez derbasî hundir bûm û bandoreke pir bihêz li min bû. Yanî çima Efrîn? Dayîka te li pêş çavên te be û mirovek were zererê bigihînê, tu yê çi bikî? Em gur bûn, tengijîn, rabûn, daketin... lê min got divê ez tiştekî bikim, ji ber ku berxwedan ne tenê bi tivingê ye. Du rojan ez li hundir mam û min tiştek nekir, tenê dema dengê topbaranê dihat, ez derdiketim. Min zanîbû ku birîn dê çêbibin, lê min nizanîbû ku ew qas dê kûrtir bibin. Ji lew re di pê destpêbûna êrîşê bi du rojan, hema herî pêşîn min navnîşana romana xwe nivîsî “Efrîn… Destane û Birîn”. Carinan sê roj û sê şevan ji malê dernediketim. Paşê ez neçar bûm ku dakevim gundan û li nava bajêr bigerim, da ku nerînên xelkê bigirim. Min li çavên xelkê dinihêrî, di çavên her kesekî de gelek bersiv hebûn, lê pirs windayî bûn. Dema ku ez diçûm bajarê Efrînê ez hestewar nedibûm ku şer heye, ji ber ku her tişt normal bû û her kesî karê xwe dikir. Dema ku ez ji bajêr derdiketim, min dinasî ku tiştek çêdibe; xelk şêt mabû û gelek pirs li ser zimanan hebûn. Dema ku ez êvarê vedigeriyam malê, min nêrînên xelkê, tiştên ku min dîtin û di çavên xelkê de xwendin, gotinên li ser zimanê xelkê, bêdengiya xelkê û xebata wan hemî bi rengekî wêjeyî dinivîsîn. Min li ser pelê nedinivîsî, hema bi dest xwe re min li ser komputerê dinivîsî. Carekê min dinivîsî û li derdora gund topbaran çêbû, hundirê malê tev hejiya; eger min komputerê xwe negirtiba, komputer jî diçû û roman jî diçû... Her bêjeyeke ku di romanê de hatiye nivîsîn, bi şewata dilê xelkê hatiye nivîsîn; her peyvek êşek e, her tîpek birînek e.

Merwan Berekat
AWIRÊN ROYÊ
Roman

- Di seqa û atmosfera şer de, nivîsîna romanekê hêçan û tecrubereyeke balkêş e. Tu çawa vê serbihoriyê dibêjî?
Ez ê çi bibêjim! Tecrubeyeke pir biêş bû. Ev roman ne tenê di nava topbaranê de hatiye nivîsîn, lê belê dêya min jî nexweş bû û li nexweşxaneyê dima. Rojane divabû ku ez herî kêm yek demjimêrê li bal dêya xwe rûniştama û min dermanê wê peyda bikira. Hetanî aniha ez li xwe şêt dimînim ku çawa min nivîsî! Min xew nedikir. Min û xewê me dijberiyeke pir mezin bi hev re kir; hetanî sibehê ez hişyar dimam. Lê dîsa dibêjim ku ez sipasiya malbatê dikim, ji ber ku dema ez diketim hundirê xwe û min komputerê xwe vedikir, êdî hew tu kes bi ser min de dihat. Rojên dawiyê yên herî zehmet bûn, ji ber welatiyên gundên derdora me penaber bûn û du malbat di mala min de bi cih bûn. Bi rastî tecrubeyeke wisa ye ku nayê pesindan.

Di heman rojê de hem bavê wê hem jî destgirtiyê wê şehîd dibin.

wiha min nivîsiye ku çawa kurdan şerê tarîtiyê kiriye. Wisa dom dike hetanî ku digihim berî destpêbûna êrîşê. Paşê rojnamevanek derdikeve û der barê êrîşa li ser Efrînê de ji hemî çîn û pêkhateyên civakê nêrînan werdigire. Lê kesa ji destpêka romanê hetanî bi dawiyê dimîne, nojdarek e ku navê wê Bêrîvan e. Bavê Bêrîvanê şivan bû. Dema ku şer dest pê bû, bavê ewî şivanî jî jê re gotibû ku tu yê pezê xwe ber bi Çiyayê Hawarê ve bibî û her wiha gotibû ku çar berxên nêr di nava pez de hene, tu yê her rojê berxekî ji şervanan re serjê bikî û bikî xwarin. Lê bavê Bêrîvanê jî pezê xwe dide kesekî din û ew jî diçe şer. Destgirtiyê Bêrîvanê jî leşkerekî Erka Xweparastinê ye. Di dawî de bavê Bêrîvanê di şer de birîndar dibe û wî tînin Nexweşxaneya Avirîn. Bêrîvan bavê xwe derman dike û dibîne ku şervanekî birîndar anîne nexweşxaneyê, ew jî destgirtiyê wê ye. Di heman rojê de hem bavê wê hem jî destgirtiyê wê şehîd dibin.
Bêrîvan roja din gustîlkê ji tiliya xwe derdixe û dixe ya nîşanê, her wiha dibêje: “Ji vir û pê de navê min Tolêstîn e, divê ez tolê bistînim.” Îcar Bêrîvan dixebite û di pir cihan de tolê disitîne. Bêrîvan li eniyên şer jî birîndaran derman dike û tola xwe ji birîndarên dijmin disitîne. Ji vê yekê yê bijîşk dibêje Bêrîvanê ku ev ne ji sincên kurdan, ne jî ji sincên nojdaran in ku birîndaran bikujin. Bêrîvan baş bersiva xwe dide, lê di dawî de wê ji Nexweşxaneya Avirînê bi dûr dixin. Bêrîvan xebata xwe ranawestîne û nojdariya xwe bi awayekî xwebexş didomîne. Bûyerên Barîn û Avestayê jî di romanê de derbas dibin. Paşê xelk li pey hev rêz dibe û di Çiyayê Xewnan re derbas dibe. Careke din li Çiyayê Xewnan Bêrîvan û çend hevalên xwe yên nojdar çend kevir dane hev, sitargehek lêkirin û birîndarên ku hene di wir de derman kirin. Dawî derman xelas dibe, îcar Bêrîvan pişta xwe dide zinarekî, nerînên xwe li Deşta Cûmê û Darên Zeytûnan dimeyîne û dibêje: “Birîna mezin û kûr Efrîn e, dermanê wê tenê rizgarkirina wê ye.”
- Der barê çapkirin û weşandina romanê de, li kû û kengê tê çapkirin?
Ev tenê ne pirsgirêka min û vê romanê ye, lê ev pirsgirêka hemû nivîskarên kurd e mixabin! Bi sedan berhemên wisa hene ku hêj nehatine çapkirin û negihane ber destên xelkê. Tu kes li berheman bi xwedî dernakeve û tu kesî ji xwe re nekiriye xem. Lê eger berhemeke evînî bûya, dibe ku xelk lê bibeziya.
Mirov wekî çiyayekî rût e, tiştek lê tune ye. Lê ku tu bixwazî buhareke rengîn lê çêbibe, divê ku baran lê were. Lê ku tu bixwazî hêj kanî jî di wî çiyayê de vebin, divê ku baran pir xurt lê bike. Lê eger ku tu bixwazî ava ewan kaniyan were vexwarin, divê ku ew ewrên ku baran ji wan dibare, ewrine paqij bin. Ji lew re dema ku kanî der dibe û diherike, ma ne bi herka xwe re kulîlkan li derdora xwe dibişkivîne. Lê mixabin li nava kurdan û bi taybet li Rojavayê Kurdistanê, kesekî ku li tîpan xwedî derkeve tune ye. Ma ne ev berhem têne nivîsîn da ku xelk bixwîne..!

Eger ez li şûna mîr Celadet bûma ku rêzimana kurdî nivîsiye, min ê cînavka “ez” rakira, bila tuneba!

- Wekî welatiyekî Efrînê ku hetanî vê gavê tu di hundirê bûyerê de dijî, bi nerîna te gunehê kurdan di dagirkirina Efrînê de çi bû?
Bi lihevnekirin, neyekrêzî, partîtî û mejiyê xwe yê teng hemû partiyên kurdî di der dagirkirina Efrînê de berpirsyar in. Eger em yek rêz bûna û lêvegereke me ya siyasî hebûya, bê guman em ê ne di vê rewşê de bûna.
Eger ez li şûna mîr Celadet bûma ku rêzimana kurdî nivîsiye, min ê cînavka “ez” rakira, bila tuneba! Ha ev rewşa em tê de, ji encamên ezeziyê ye. Xelk aniha heyîrî maye; hin dibêjin em ê vegerin malên xwe û hin jî dibêjin na. Îcar di navbera “vegerin” û “venegerin” de gelek çîrokên êşdariyê çêdibin.

Ta zinarek hebe ez ê bimînim û ta bihostek ax jî hebe ez ê li serê rûnim

- Bi destpêbûna êrîşa li ser Efrînê re bi sedhezaran xelk penaber bû, lê hetanî îroj tu li Efrînê mayî; tişta ku te bi xaka Efrînê ve dide girêdan çi ye?
Bira can ez di nava vê axê de mezin bûme, bêhan vê axê ketiye xwîn, damar û giyanê min. Li ser kevirên vî çiyayî lîstime û min kulîlkên vî çiyayî bêhn kirine. Darên min ên zeytûnan hene. Tu carê ez nikarim xwe jê bibirim. Ta zinarek hebe ez ê bimînim û ta bihostek ax jî hebe ez ê li serê rûnim. Eger ez mirim jî bila ew zinar bibe kêla min û ew bihosta axê jî bibe gorna min.
- Berxwedana ku li Efrînê bû, bi yek hevokê bipesinîne?
Miletê ku li ber xwe nede, miletekî mirî ye.
- Divê çi bihata kirin hetanî ku Efrîn neketa?
Bersiva evê pirsê di romanê de heye.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Serpêhatî

Sofî û Şêx

Dildarê Mîdî

Sofî berê xwe da gundê Til Marûf, da ku çavên xwe bi dîtina şêxê xwe ronî bike û hem jî tobeya xwe nuh bike .

Piştî ku ji postê (mîkro) daket, li ser Pira Nametiyê rawestiya û çavên wî li rêya otombîl, motorsiklet an jî erebeyekê man, da ku lê siwar bibe û biçe gundê Til Marûf. Dunya germa havînê bû. Qaseke baş li ser wê pirê ma, bêyî ku tu wasîteyek were ku wî bigihîne gundê şêxê wî. Ha piştî demekê dît ku wa 20-30 otombîl li dû hev tên û otombîla şêxê wî li pêşiya wan e. Kêfa wî gelekî hat û ji xwe re got :"Ku Xwedê çêdike, halo ye."

Sofî nemerdî nekir, tevlî rih û şaşika xwe bezî pêşiya karwanê otombîlan, da ku bi wan re siwar bibe. Lê mixabin şêxê wî qet li wî hoveneda, li wî nesekinî. Şêxê wî li gel tevahiya kerwên derbas bû, bêyî ku yek ji wan otombîlan li Sofî bisekine û wî bi xwe re siwar bike.

Sofiyê pepûk bê zar û çare li cihê xwe ma û ji xwe re got :"Wey bavo! Ez çi dibêjim û tembûra min çi li min vedigerîne? Ez li kû û mala dawetê li kû..!"

Hema sofî di cî de polî poşman vegeriya mala xwe. Çawa ku derbasî malê bû, bi dest xwe re bang li jina xwe kir û gotê:

– Keçê, jinikê... li bayê bezê ji min re makîne û şufreyekê bîne! Da ez vê riha dirêj biqusînim û xwe ji wê xelas bikim.

Jina wî matmayî lê vegerand:

– Pepû, pepû, waweylê waweylê... kuro tu dîn bûyî..! Ma ne tu ji biçûkaniya xwe ve tobedar û sofiyê mala şêx î. Tu yê çawa riha xwe kurt bikî?

Sofî keserek kêşa û bi dengekê nerm ji hevjîna xwe re got:

– Keçê ew şêxê ku li ser Pira Nametiyê bi kêrî min neyê, ka ew ê li ser Pira Selatê çi ji min re bike!!? Hey te heft xwelî li serê min kirê lêêê…!

Gotarên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.

Gastînên Têkiliyên Rewşenbîr û Civakê

Xalis Misewer

Di pêşî de divê em zanibin ku rewşenbîrê resen ew e yê ku xwediyê zihniyeteke vekirî ye û bi pergaleke têgihiştin û ronakiyê ve mijûl dibe. Her wiha rewşenbîr ew e ku ji rewşenbîrî û zanisteke resen dagirtî ye ku dikare civaka xwe ya lipaşmayî û bindest bi aliyê pêşxistin, guhertin, hêviyên têkoşîn û azadiyê ve bibe. Ji bilî vê jî divê rewşenbîr wijdanê nîştimaniya xwe be, navnîşana guhertin û serxwebûna wê be ku pîvanên pêşketin û şaristaniyê li ser milên wî bên avakirin, da ku di nav netew û welatên din de bingeha peyama miletê xwe hilde jor û guhertin û pêşketinan ji bo civaka xwe bi awayekî herî aqildar, pilebilind û mirovahî biafirîne.

Civak jî bi rola xwe rewşenbîr li pêş dixe û asta wî bi aliyê guhertinê ve dibe. Lê berçav e ku rewşenbîrê kurd ê ku îro bê vîn û îrade maye, nikare bi rola xwe ve rabe û civaka xwe bi awayekî bi rêk û pêk li pêş bixe. Rewşenbîr bi piranî ber bi siyaset û civaka bijartî ve hildikişe, bi giştî ji bûyerên civaka xwe bi dûr dikeve. Lê kelemên herî mezin li ber rewşenbîrê kurd îro ew in ku nikare vê jihevketina siyasî ya herî kûr di bingeha civak xwe de çareser bike û di nav hemû aliyan de pêwîstiya hebûna rewşenbîriya xwe mîna hêza çareseriyê teqez bike. Dibe ku ev pêşveçûn û guhertinên ku em dixwazin ne li gor berjewendiyên wî bin, wê demê rewşenbîrê keysebaz dê nebe pêşkêşê civak û miletê xwe. piraniya rewşenbîrên me îro di rewşeke bêpergal de xwe didin nasîn; bê guman gelek sedemên din jî ji vê taybetmendiyê re hene:

1- Rewşenbîrên me di roja îroj de di ezmûneke nû re derbas dibin ku hêj rol û têkiliyên xwe bi milet û civaka xwe re baş nas nekirine û nikarin di vî warî de rolên xwe baş bi kar bînin. Ji ber vê yekê jî, rewşenbîrên kurd bê navber xwe bi aliyê gengeşeyên siyasî ve dikişînin.

2- Piraniya rewşenbîrên me her dem xwe di bin çengên siyasetmedaran de dibîne, berjewendiyên xwe bi wan re dibîne û bêdengî û peyetiya xwe ji wan re dide xuyakirin. Tê xuyakirin jî ku piraniya van rewşenbîran bê lêborîn pişta xwe daye civaka xwe, vî tiştî hiştiye ku rewşenbîr ji civakê bi dûr bikevin û di deryaya mîtafîzîkeke neriyalîzm de melevaniyê bikin.

Markis dibêje: "Fikir û ramanên mirov ku gavan bi aliyê materyaliyê ve neavêjin û milet li wan bi xwedî dernekeve, ew fikir nabin fikirine civakî."

3- Rewşenbîr pirê caran li belavbûna dengê xwe digerin û di vir de rewşenbîr tu karîzmayên rewşenbîr û ronakiyê di xwe de nacivînin; ango rewnşenbîrên kurd wekî ku tê xwestin xwe ji rewşenbîriyê re dane girtin, ji ber wiha wan nikarîbû di golên guhertin û ronakbîriyê de avjeniyê bikin.

Ji ber vê yekê, divê rewşenbîr di warê bûyerên civaka xwe de bêhtir têgihişt û ronak bin.

Sartir dibêje: "Erka rewşenbîr ew e ku li hember astengî û kelemên li pêşiya nîştimaniya miletê xwe li ber xwe bide." Ev jî tê wateya ku erka rewşenbîr ew e ku ji birca xwe ya Belek dakeve nav refên milet û civaka xwe, da ku wan bi aliyê asoyên pêşketin û guhertinên bilind û firehtir ve bikişîne. Lê mixabin rewşenbîr nikarîbû vê rola xwe pêk bîne û xwe li ber devê rewşenbîriyê reben û bêmical hiştiye.

4- Ji aliyekî din ve rewşenbîr xwe kêmxwendin hiştiye, ango ew naxwîne û rewşenbîriya xwe bi pêş ve nabe. Heta ku bixwîne jî, xwendin û rewşenbîriya xwe naxe xizmeta civaka xwe.

5- Ragihandin jî bi rola xwe rewşenbîriyeke sivik û ne kûr li ser sifriyeke bêwestan dide rewşenbîr û wî bi rewşenbîriyeke cidî û resen ve mijûl nake. Ji lew re tiştekî balkêş tune ye ku bide milet, ji ber wiha jî ew qasî bandora wî li milet tune ye. Wiha milet jî wî napejirîne û wî mîna rêber û pêşkêş ji xwe re nabîne.

Bersiva Pirsekê

M.E.Osman

Dema em li ser babeteke berfireh mîna mijara "zimanê dayikê yan jî zimanê dayik" baxivin, pêdivî bi bikarhanîna peyvên wêjeyî heye da ku di rengê pexşan an jî hêçaneke geş de were. Her wiha pêwîst e em xemxurên ziman bin û em zimanê xwe baş zelal bikin; ango bi zimanekî petî û bê gerd binivîsin, çikû em ne li ser bûyerekê daxivin û em dixwazin hema bi pele ragihînin bo xwendekar û lêkolînvanên zimanê kurdî yan jî wan agehdar bikin.

Helbet cihê rêzê ye ku mirov bi şêweyekî zanistî bayex û pûte bi vê mijarê bide. Ev mijar têkildarî têgihiştina mirov bi giştî û ji dayîkê re ye. Wekî hizir, "dê" wateya herî bilind di hişê mirov de dihêt bercestekirin, çi mirovê heye bê guman di zikê dêya xwe de mezin dibe, ev dê wek nimûne bi tenha ye, ango bi serê xwe ye, lê di zikê dê (malbiçûk) de zar gulxetkî nabe; ev jî dihê wateya ku ziman ne zikmakî ye, ango navkirina zimanê mak ne rastîyeke zanistî ye û gelek zanyarên derûnî û biology vê rastiyê tekez dikin. Peyva zikmak beramberî ya ingilîzî "Congenital" digire ku dabaşa zarokê di zikê dayîkê de dike. Di paşerojê de jin an dê zarî hînî pêsîra xwe dike -wek yekem rahênan jê re-, paşê piço piço dê dest bi rahênana mezin dike ta ku wek kurd dibêjin "bi ser benê golikê ve dibe". Hingî dê perwerdeya zehmet li ser milê xwe dikişîne, yek ji wan fêrkirina ziman e. Di hemû qonaxan de dê hînkar e û nemaze ji alîyê ziman ve, mînakên berçav pir in; dê dikare peyvekê gelek caran dubare bike ta zara\ê wê baş fêrî bilêvkirina wê peyvê bibe. Ev pirsên jorî me dan ji hêla erkên dê ve ne.

Wek me got, di hizir de "dê" xwedîya wateyeke herî bilind e û pêwîst e em emekdar bin, qencîyên wê pêpest nekin. Dema em dibêjin zimanê dayikê yan zimanê dayik, em pir çewt diçin, ango em koşeşa wê badîhewa dikin û pê biçûk dibe. Li gorî binemayên zimanê kurdî, berfirehîya peyva dê li ser hemû jinan belav dibe. Dêya kurd ne yeke lawaz û biçûk e mîna dayik, lê belê peyva dê hîn mezintir dibe bi qasî neteweya kurd berceste dibe. Li gorî rêzimanên zimanê kurdî, çi navê kurdî heye bi tenha xwe nîyas (nasyar - naskirî) e, lewre ya durist ew e ku em bibêjin "Zimnê Dê". Li gorî pirsa erebî:

"اللغة الأم – الأم هنا معرفة وجميعنا يعرف من هي. "

Ev şehnazî û pozbilindî li cem ereban her wisan li cem ingilîzan jî peyda dibe dema dibêjin:

"The mother language , which mother ? we all know which she is."

Lê çima em xwe wisan biçûk û histûxwar dibînin û em dibêjin "Zimanê Dayikê"!? Bi gumana min wê gilî ev pirs be.

RÊZIMAN

Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 1

Deham Ebdulfetah

Zimanê Kurdî yek ji zimanên malbata Îranî ye. Ew malbata ku ji zimanên Kurdî , Farisî , Bilocî , Baştoyî , Osetî û hin zimanên dîtir jî pêk tê. Girêdana vê malbata zimanan bi koma zimanên Hindo-Ewropî û yên Hindo-Îranî re jî heye. Bi egera vê girêdanê jî gelek bêje û derbirînên cûrecûr di nav wan zimanan de hevbeş in. Ferhengên wan zimanan jî wê girêdan û pêwendiyê berçav dikin, mirovantiya wan gelên ku bi wan zimanan diaxivin tekez dikin. Anku ew ziman tev, weku zimanine serbixwe li koka xwe ya "Arî" vedigerin û li wê kokê digihêjin hev.

Hin dîroknas û lêkolerên zimanên dêrîn (kevin) dibêjin, ev dabeşbûn û şaxvedana van zimanan, bi vê piranî û belavbûnê ji encama wan koçberîyên êl û hozên gelên Arî ye.

Di serdemên kevin de gelên Arî ji cihwarê xwe (nêzî deryaya Xezerê) bi çend pêlan koçber bûne[1].

- Kocberên pêla yekem ber bi rojava ve koçber bûne û li parzemîna Ewropayê belav bûne. Li wan herêm û navçeyan nîştecî bûne .

- Pêla duwem jî, berû başûr (Kendava Farisî-Erebî) û ber bi rojavayê (Qefqasiya) ve çûne û heta bakûrê deryaya Xezerê belav bûne .

Ew êl û hoz bi navê gelên Îranî hatine nasîn û zimanên wan jî bi navê: malbata zimanên "Îranî"dihatin naskirin

- Pêla sêyem jî berû rojhilat û başûr ve çûne. Ew koçber bi navê gelên "Hindo-Îranî" hatin nasîn, zimanên wan jî bi navê komzimanên "Sansekrîtî" dihatin naskirin .

Hinek dîrokzan û karnasên zimanên kevin dibêjin, navlêkirina "Hindo-Ewropî" ji vê têgeha ku pê hatiye nasîn firehtir e. Anku, hemû zimanên ku ji koka Arî hatine der, ji Hindistanê ta Amerîka hemû dikevin bin sîwana navê "Hindo-Ewropî", wek koma zimanên Sansekrîtî, Îranî, latînî, Girmanî, Silavî, Girêkî (Yûnanî) û hinên dîtir… [2]

Li vê gorê em dibêjin, zimanê Kurdî yek ji komzimanên Hindo-Ewropî, malbata zimanên Îranî ye. Lê ev ziman bi taybetmendiyên xwe yên resen zimanekî serbixwe ye. Rast e hin têkiliyên zimanê Kurdî (ji hêla hin bêje û derbirrînên hevbeş ve) bi hinek zimanên dîtir ve (çi kevin, çi nû) hene, lê ev jî nayê wê wateyê ku zimanê Kurdî şêwezarekî zimanekî dîtir e .

Ew têkilî di hin zimanên dêrîn, wek Somerî, Avistayî û Pehlewî de diyar dibe .

Zimanê Somerî

Di zimanê Somerî de hinek gotin û derbirîn bi heman deng û wate di zimanê Kurdî de jî bi kar tên. Vê diyardeya zimanî bala hin rewşenbîrên Kurd rakişand wê bawerîyê ku girêdaneke dîrokî di navbera zimanê Kurdî û yê Somerî de heye. Ev jî tê wê wateyê ku têkilîyeke regezî wan her du gelan bi hev ve girêdide, anku Somerî pêşiyên Kurdan in. Bo tekezkirina vê baweriyê wan rewşenbîran dest bi lêgerîn û lêkolînan kir, niyazên dilên xwe di belavok û rojnameyan de eşkere kirin.

Di salên heştêyan de hinek nivîserên Kurdên başûr ew bawerîyên xwe der barê têkilîyên Kurd û Somerîyan de li ser rûpelên rojnameyên Erebî û Kurdî weşandin. Hin nivîserên Ereb ew nêrîna nivîserên Kurd pesend nekir û bi tûndî raberî wan rawstiyan. Gengeşeyeke nivîskî di nav her du alîyan de germ bû. Her alîyekî li Somerîyan dinêrîn wekî ku pêşîyên wan bin .

Di sala 2000'ê de serokê Îraqê ferman da dîrokzanên welatê xwe ku di konfiransekî zanistî de rastîya koka Somerîyan diyar bikin.

Di encamê de hemû beşdar gihiştin wê biryarê ku tu girêdan û têkilî di navbera Somerî û Ereban de nîne.

1- مسعود محمد لسان الكرد بغداد 1987
Mes'ûd Mihemed : Zimanê Kurdî. Bexda 1987

2- Dr. Ihsanyar Şatir : "Berçavkirina kurtedîroka ziman û şêwezarên Îranî û gorankariya wan.Tehran "
إحسانيار شاطر : //عرض موجز لتاريخ اللغات واللهجات الإيرانية وتطورها// . مجلة الدراسات الأدبية-(السنة الثالثة – العدد الثاني (1960
ص165-166 – ترجمة وعرض : أحمد لوسياني - بيروت

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî... Can Ibrahîm

QEDERA ERZAN

Di bin baskên şevê da
Şevek direj..
Û ji hev kişyayî
Şeveke seranser..
Û bi baskên xwe westiyayî
Li guhdariya pêgên bilez..
Pêgên bêwar!
Xelekên karwanên melûl..
Û istûxwar û westiyayî
Li her dû piyên xêza..
Rêçika tarî siwar in.!
Bi awirên Ehrîmanê ne bi xêr
Berî li mijê kor..
Û lêgera wenda.!
Pişt li dîwarên mane kavil
Li ser maseya bazaran..
Qedera me pir erzan e.!
Çi talan e..çi wêran e..
Qedera gelê me erzan e.

■■■■■■■

Şax.. bi şax
Kolan.. bi kolan
Palikandin û gera..
Li cîhekî xewê
Û xew dûr e ji wan çavan
Di quncikê xewar de..
Tenê pirsek di pişt perda dil de
Payî û dilşikestî maye..
Pirsek bêdeng..
Pirsek sirgûn.!
Û çav hêsrên xwe dadqultînin
Li veşartina girî..
Di demsaleke.. qîr û qetrane
Nalîna dapîrin şiyar
Û hawara ji qolincên şevê peyda
Ku bi her janekê re hatî istirane
Çi talan e..çi wêran e
Qedera gelê me erzan e.

■■■■■■■

Çi wêrek e qeder..
Di bextê gelê min de
Çi wêrek e keser..
Di rûyê dijmin de
Li ser doşeka ji toz û axê
Li gel hevaliya xewneke
Bi hêvî û aram
Serî li ser buxçika derdan
Û bi kul û kederan nixamtî ne
Girî û gazinin zarokên birçî..
Awazên şevê ne.!
Li guhdariya bersiva:
Tenê de razên razên
Wê xezal we têr bikin
De razên nivşên xêrnedî.!
Çi talan e..çi wêran e
Qedera gelê me erzan e.

■■■■■■■

Gelo çend birîn li wî qilafetî
Vebûn û zuha bûn..
Û çend mîr..
Di mîrgeha xewnan de
westiyabûn
Her ku şev..
Bi sirûde jiyanê re kal dibin
Fîxanin çûk û bilbilan lal dibin
Tenê misdana eniya pîrequrçî
Wek ku ji istiriyan diteziya..
Û her ku bal kûr li waran ved-
gerin
Bi her çixaran re kulên xwe..
Dipêçin û dişewtînin
Û bi dûmana çixaran re..
Keserên bextreşiyê berdidin
Di nav hevîrê bîranînan de..
Janên xwe distirên û dibêjin
Li ser maseya bazaran
Qedera me pir erzanne
Çi talan e.. çi wêran e
Qedera gelê me erzan e
Qedera gelê me erzan e

LI VIR

Li vir didirûm
Ez kerasekî
Li bejna welatê kevnar
Kêl bi kêl
Bi tayê evîna xwe
Dikim yek
Qurskên Saykis Bîko
Li vir tariya şevê
Ez dikujim
Bi evsaneyên
Mirazxwazan
Serma çeleyên dijwar
Koçber dikim
Bi bihara peyvên xwe

* * *

Bi bayê kesera
Ji kûraniya dil
Dûr dixim
Ewrên reş
Bi germaya argûnên zivistanê
Ku sar nebû bi derbasbûna
Bask çermên şevê
Şilahiya livên min bi hêsiran
Mijûl û kelegirî dibim
Perên baskên min şikestin
Û bayekî tûj ji hilma min

* * *

Li vir singên konên bêrîvanan
Vegirtî ne li ser çetel û istûnan
Pêgên pêxember û pakrewanan
Ne newala qertel
Û hov keftaran
Li vir warê şahbazên mihrevan
Nimêj û buhişta dilên zelal
Warê sincirandina
Olperestan
Diz, rovî û çeqelên
Tirsonek

* * *

Tenahiya min û rastiya raman
Li ser dûrbûna min
Ji ava gerekî



Li rûyê din sist û melûl dibim
Guvaştina dil li dû penaberan
Ji qolinc û sanciyên deryan
Bi bêdengiya pêlên xedar
Li şop vegera tûr û buxçan
Li ser gemiyên mirinê dicivin

* * *

Li vir sond û soza min
Li paş deriyan jiyana bêromet
Xeyala buhşte derew
Meraqa mejiyên qelis
Parsa der..... bi der

Xurbet a sar û bêûd
Li vir şad û serxweş dibim
Bi istranên her dû yaşepîran
Baqî Xido û Mişte Nûr
Dîlana çiçekan bi awazên geş

* * *

Dest bi dest avahiya însan
Birîn bi dîtina hev zuha dibin
Hemû çav li bejna azadiyê ne
Hemû dil warên jînê ne
De bes e îdî qedera bikul
Oxira hemû rengên mirinê ji vir
Li vir nixmandina darbesta min
û te ye
Li ser parçedîwarên mayî

* * *

Bîranînên me ne
Navên min û te ne
Tev çîrokên me ne
Êşên min û te ne
Ken û giriyê me ne
Lîskên min û te ne
Xemil û xêzên me ne
Hêviyên min û te ne

DE BES E

Ji min tê ku ez bigrîm
Û bikime qêrîn û hawar
Ji kola xwe ez danaynim vî barî
Ji min tê ku ez bigrîm ..
Û bigrîm.. û bigrîm..
Ta ku giryê min jî bigrî ..!

* * *

Di gewriya min de maye
Peyveke girêday û derneket
Roj bi roj ji laşê min dixwê
Û hêdî hêdî berve mirinê
Min dikşînê

* * *

Vê şevê maye dilopek hêsir
Di nav bijangên min de û ner-
jiya
Li ber çavê min dinya kiriye
miiij
Û hêdî hêdî berve korbûnê
Min dikşînê

* * *

Qey dayka min navika min
xistibû
Nava malikên helbestan
Ku di her şevê de hestên min
dinalin
Û hêdî ...hêdî berve dawiyê
Min dikşînê

* * *

An jî ji pêsîrên hilbirî
Ez mêjandibûm û
Bi westandinê ez şîrevekirbûm
Û hêdî ...hêdî berve birçîbûnê
Min dikşînê

* * *

Ji zenglê xaçkirina Îsa de
Û di azana bergera Xwedê de
Were ji dilê min vexwe evîna
Evesta û
Bigre destmêj
Tewaf..û
nimêj..

* * *

Di civata şêx û melan de
Her car kefenê min dibirîn
Bi xwediyê sim û sindifan re
Diketim çanda kêm û
Hêdî.. hêdî
Rê li min dibirîn

* * *

De bes e girêdana qemçikan
Li ser eniya, ji janan qurmiçî!
Û rûniştina bêkêran
Li ber koziyên germ
Û xewnên beravêtî
Di şevên zivistanê de

* * *

De bes e birîna çîrok û
çîvanokên
Li ser ejdeh û dêwan
Mirîdî û sofî mendiya şikeftan
Û rojîvekirina
Bi xurmakê di çîlan de

* * *

De bes e talîzoka avis
Bi her dû cêwiyên sert
Pûk û zîpikên dijwar
Êdî bela xwe ji min veke

* * *

Ji nav lêvên birîna di laşê min
de
Kêma kolan diherikê
Xapandin û talana bi biratî
Û ji sahiya dil di her bazarê de
Ez dimam ketî

* * *

Ka wê çi hilm bê ji şîrava gulan
Di şana mêşan de
Û ji bejin û pelên rîhana nixamtî
Di çarşiya nexasan de
Bi destê bazirganan
Dihatin kirîn û firotin!

* * *

Ji similên şûtik ..
Qilçix ..û pûş
Wê çi nan bê werbêjkirin
Û li ser kîjan sêlê
Wê bê bêraştin
Di bervaciya şîret û şaran de

* * *

Di berbanga açixî de asîman
Dawên tariyê hildimale!
Aşkere dikê laşên reş
Di bin kerasên spî de veşartî

* * *

Û her îmze û pêçkirina li ser
Dîrokeke xwar û jihevketî
Bi her rengên qurskan
Hatî pînekirin
Bi zengara salan
Ji Nemrûd ta Eyad
Ku li ser rûkeniya min bi hovetî

* * *

Vê şevê bext û qeder
Vê şevê bext û qeder
Porê min vedpincirîne
Li ser şanogeha demê
Min dibe û tîne
Berdin girêdana fût û eban
Û çong berdana
Li ber zarên pêkeniyê

* * *

Carekê ji hêla rêjîma Sûriyeyê ve, carekê jî ji hêla çekdarên rêxistina DAIŞê ve pirtûkxaneya wî hatiye têkdan û berhemên wî jî di nav de hatine şewitandin. Lê belê li ser şopa xwe rijd maye û dest ji helbestê bernedaye.

Helbestvan Can Ibrahîm, di sala 1969'ê de li gundewarê Kobanê ji dayîk bûye. Qonaxên xwendina xwe li Reqayê diqedîne û demeke dirêj li wir dimîne. Paşê di 2011'ê de careke din vedigere Kobanê.

Ji sala 1988'ê ve dest bi nivîsînê kiriye û aniha berhevokeke wî ya helbestan bi navê "Lorîn" heye. Jê û pê ve, berhemeke wî bi zimanê kurdî û yek jî bi zimanê erebî hêj destnivîs in.

Ji sala 2015'ê ve li bajarê Qamişloyê bi cih bûye û di xebat û çalakiyên wêjeyî de her beşdar e.

De bes e di siya şermiyê de
oldarî
Ku kerasê qeşmeriyê li min
dikirin
û
Derbaskirina min
Di bêjinga sekeratê re û
Hêdî ...hêdî berve tunekirinê
Min dikşînê

KÊLIYEK RÊWÎ

Tenê carek
Erêê carek..
Xwezî carek..
Vegere hola dil
Di beriya eşqa min û te de!
Min azad ke..
Ji fermana veqetandinê
Ji êşa dûrbûnê
Tenê carek..
Bibe mihvana min
Di kêliyek rêwî de
Di navbera:
Oxirkirina heyva fedyok û
Zayina roka kenok
Bi hûnandina:
Teşiya çîvanokên min û te
Li ser çonga sibeha xewrevok
Tenê carek
Geş ke jiyana min
Bi hêvanê:
Kenê xwe yî dînok
Erê.. erê
Di evîna tîr de
Destarê xwe
Li paş vedgerînim
Dikevim nav
Mijê bîranînan
Li qeraxên gola çavê te
Tenê carek
Tê bala min
Avjeniya min
Di derya dilê te de
Di rojên ku derbasbûyî
Ji tîbûn û rewrewka
Havîna û payîza
Bê te çilmisî
Bask firî me
Di asîmanê pesnên te de
Xunavî dikeve
Dilê min î miçiqî
Tenê carek
Erê carek
Xwezî carek
Min karîba
Bexçakî gulan
Di dilê te de, biçanda
Larîn û jînar
Ji ser lêvên te
Bida hev û bikira
Gurzek rûpel
Ji çîroka xwe ya bedew re
Tenê carek
Bi çavdîtina te
Min birîh û bijangên
Helbesta xwe kil kira û
Ji biskên
Sist û berdayî
Li ser rûyê te
Ji xwe re niviştek
Bipêça
Ku biba arvanê dilê min
Di tenahiya min û kavilê
Liv û tevgera te
Tenê carek
Min karîba
Sancî ji şevê hilîna
Bi şêweya evînê û
Bext bi te ra spî kira
Di merdiya biharke rengîn
Bi fîxanên kenê te
Tenê carek..
Erê carek ..
Xwezî carek..!

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kultûrname

DILQÊ MEDRESEYA KURDÎ DI VÊJEYA KURDÎ DE -4

Zeynulabidîn Zinar

Hin şexsiyetên wisa ji Medreseya Kurdî derketine ku ew êdî bûne malê dinyayê, wek Selhedînê Eyûbî yê Kurdî ku bûye hîmdarê duyemîn ê ola Îslamê û wek Îsmail Cizîrî (1136-1206) ku ew wek bavê robot û computerê hatiye pejirandin. Her wiha ev e çend kesayetiyên li jêrê ku berhemên Medreseya Kurdî bûne:

- Mewlana Xalidê Kurdî (1773-1826), hîmdarê duyemîn ê Rêçika Nexşebendî bûye.
- Ehmedê Xanî (1651-1707).
- Elî Teremaxî (Sedsala IV, hicrî).
- Feqe Reşîdê Hekarî.
- Feqiyê (Mihemed) Teyran (1590-1660).
- Mele Ehmed Huseyn Bateyî (1417-1491).
- Mele Mehmûd Bazîdî (1797-?..)
- Mele Seîdê Kurdî (Norsî).
- Mele Ûnis Herqetênî (1785-?).
- Mele Xelîlê Sêrtî (1753-1843).
- Mûrad Xanê Bazîdî (1772-1832).
- Pertew Begê Hekarî (?.. -1806).
- Selîm Silêman (Sedsala 16-17).
- Şerîfxanê Colemêrgî (1693-1748).
- Şêx Diyaedîn (Navdarê bi Hezretê Norşênî).
- Şêx Ebdulqadir (1908) Nehrî.
- Şêx Elî Herîrî (1010-10789).
- Şêx Evdirehman Axtepî (1850-1910).
- Şêx Mela Ehmed Cizîrî (1570-1640).
- Şêx Seîdê Pîranî.
- Şêx Ubeydulah Nehrî (1880).
- Seyîd Taha Nehrî.
- Xaris Bedlîsî (1758-?) û bi hezareha kesên wisa…

Piştî Peymana Qesra Şêrînê (1639) ku xwezaya Kurdistanê di navbera osmanî û sefewiyan de hate dabeşkirin, dîsa Medreseya Kurdî jiyana xwe domandiye; ne faris û ne jî osmanî têkilê kurdan nebûne û kurd û Kurdistan înkar û mandela nekirine. Lê piştî 1923'yan ku bakurê Kurdistanê ketiye nêv nexşeya Tirkiyê, rewşa Medreseya Kurdî bi temamî hatiye guhertin.

Piştî 1925'an, Mistefa Kemal bi navê "Kanuni Tedrisat" ew medreseyên kurdî dane girtin. Yekemîn sedemê girtina wan medreseyên kurdî ev bû; asîmilekirina kurdan û qutkirina kurdan ji her tiştên wan ên kev, xasma bêxeberhiştina kurdan ji pêşiya wan.

Îcar Medreseya Kurdî ji sedsala yazdehan ta nîvê sedsala bîstî, rola ku di parastina ziman û çanda kurdî de kiriye, em ê pir bi kurtî li jêrê binivîsin...

KARÎKATÊR

Kurdî Xweş e

Hevta	نظير	Zirîpoş	مدرعة
Rêkeftin	اتفاقية	Çêj	طعم
Dudilî	الحيرة	Xemrevîn	ممتع/ مسلي
Tawanbar	متهم	Peywir	وظيفة
Raz	سر	Serpêhatî	تجربة

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1						■			
2			■					■	
3				■					
4					■		■		
5			■		■				
6		■						■	■
7	■					■			
8						■			
9				■					

Sitûnî

1- Bajarekî Bakurê Kurdistanê. Ap.
2- Êleke kurmancan. Serbest, azad.
3- Welidî, çêlîk jê re çêbû. Hevwateya êmê ajalan.
4- Devera ku genim lê tê hêran. Xaniyê ku tiştek tê de tê hilanîn.
5- Zinar. Hez kirin.
6- Hevwateya "hiştin".
7- Xwarina êvarê. Avdar belavbûyî.
8- Mezel (Vajî) - Kirina başiyekê, dijwateya şer.
9- Devera êzidiyan a pîroz. Ufuq.

ASOYÎ

1- Manewiyat. Şelwal
2- Xwarina ajalên kedî. Aheng, dawet.
3- Zeviya ku tirî lê hatine çandin. Ji hev cuda, rengereng.
4- Dare belavbûyî. Haydê, yela.
5- Du tîpên wekhev. Keroşk bi zazakî.
6- Êvar bi almanî.
7- Amûr. Mezinê dever an jî gundekî.
8- Lêkera "azirîn" di dema borî de. Asê belavbûyî.
9- Heq. Danê piştî sibehê û berî êvarê.

Sitêrname 13

Narîn Omer

Bajarên me kurdan mîna baxên gulgulî ne, tenê kulîlkên bi xêr û bêr wan dixemilînin. Dema ku em wan bajaran bi bîr tînin, kulîlkên bajarê Senindecê yê Rojhilata Kurdistanê tê bala mirovan; bajarê ku afrînerên bi nav û deng ên mîna: Mestûra Erdelanî û Şehîn Talebanî ku hunermenda me ya aramxweş û hestnazik e, jê derketine.

Hunermenda me li bajarê Senindecê di sala 1952'yan de ji dayîk bûye. Qonaxên xwendinê li wir bi dawî kirine, piştre derbasî peymangeha mamosteyan bûye û li wir bawernameya bilind wergirtiye. Şehîn hem li bajarê xwe hem jî li gundewarê bajêr mamostetî kiriye û bi dilsozî karê xwe domandiye. Paşê şû kiriye û bûye dayîka sê zarokan.

Di sala 1989'an de bi malbata xwe ve li pêlên koçberiyê siwar dibin û li Brîtanyayê bi cih dibin. Ji bilî karê mamostetiyê, hunermenda me bi xebatên civakî jî radibe; destpêkê tevlî "Komeleya Şêr û Xorşîd Serxe" dibe û paşê tevlî çend rêxistin û kombûnên xêrxwazî dibe, hetanî aniha jî wekî çalakvaneke sivîl xebatên xwe didomîne.

Rêxistinên ku hunermend Şehîn di wan de kar dike, alîkariya malbatên hejar û zarokên nexweş dikin, Şehîn xan jî bi deng û hunera xwe bi xurtî alîkariya wan zarokan dike û tê zanîn ku di kîmyabarana Helebçayê de, wê alîkariyeke mezin pêşkêşî zarokên nexweş kir.

Ne tenê di milên alîkarî û xêrxwaziyê de, lê Şehîn Talebanî xebateke bilind û zanistî di ber mafên jinê de jî dike, ji lew re dibêje: "Jina kurd azad e lê divê ew bi kar û xebateke bêhtir ve rabe, da ku baweriya civakê bi xwe mezintir bike û karibe mafê xwe bi cih bike." Wê bi bîr û bawerî biryara xwe daye ku xebata xwe di şopa dozkirina mafên jina kurd de bidomîne.

Jiyana hunerî:

Tevlî ku hunermenda me mamoste, çalakvan û xebatkar bû, lê wê guh dida dengê xwe jî, ji lew re biryara sitranbêjiyê sitand; bi baweriya hest û ramanan û nazikya deng û hiziran derbasî hola huneriyê bû. Li ser destpêka dengbêjiya xwe dibêje:

"Min bi sitrakene romansî -ya Sebriya Gulfiroş- bi hunermendê navdar Ebasê Gemendî re dest pê kir û heta wekî îro jî ev sitran mezinan berî xortan hestiyar dike ".

Hunermenda me bi coş û hestiyarî di bin bandora siruşta Kurdistanê û xwezaya xelk û deverên wê de dijî, her wiha bi hezkirina xwe ji huner û dengbêjiyê re distire, ji vê yekê peyv û awazên sitranan rewan û bi hizir dike û bi pêlpêlokên dengê xwe hezkiriyên xwe aramxweş û coşdar dike.

Hunermend Şehîn sê kasêt û çend klîp berhem dane û di hemî sitranên xwe de li peyvên watedar ên ku hezkiriyên dengê wê şadîman û kêfxweş dikin, digere, ji ber vê yekê wê gelek caran di sitranên xwe de alîkariya

Şehîn Talebanî… Awaza Resen



hunermendê navdar "Burhan Miftî" di hilbijartina gotin û awazan de, xwestiye.

Şehîn mîna gelek hunermendên kurd sitraneke xweş diyarî Kerkûkê kiriye. Sitrana Kerkûkê ji gotinên her du helbestvanên kurd "Heme Seîd Ibrahîm" û "Simaîl Xormalî" ye û ji awazên "Burhan Miftî" ye.

Tişta herî qels di karê Şehîn de ew e ku tenê bi zaraveyê soranî distirîne û guh nade zaraveyên din ên wekî kurmancî; ji ber ku dema hunermend bi hemî zaraveyan bistirîne, dê nav û dengê wê\î li hemî aliyên Kurdistanê û derverên ku kurd lê dijîn, belav bibe.

Hunermend Şehîn Talebanî dengxweş û hestnazik e, em temenekî dirêj jê re dixwazin û gurzên sipasî û silavan li ser kar û xebata wê ya dirêj û bi sûd, jê re dişînin. Helbet ew di xak û zemîna hunera kurdî de bûye sitêreke geş.

Dîsa em ê banga xwe dubare bikin ku dezgehên ragihandinê li hemî aliyên Kurdistanê li van hunermend û dengbêjan bi xwedî derkevin û li wan guhdar bikin.

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van peyvan bi awayekî sitûnî xêz bike:

AFIRANDIN – BÊNDER –KURDISTAN – POŞMAN – BOZ – BÊDENG – ROJ –ZANIST – RÊBEND – DÎN – BÊLIMTE – BIRÊVEBIR – SOZDAR – SÊGOŞE – BAKUR – LIBERXWEDANÎ – ZÊRÎN – REŞBÛN – AŞ

Peyva windayî ji 5 tîpan pêk tê, ew jî dijwateya peyva "kurt" e.

B	Ê	N	D	E	R	P	O	Ş	M	A	N
B	Ê	D	E	N	G	D	B	A	K	U	R
Z	A	N	I	S	T	R	Ê	B	E	N	D
D	Î	N	R	B	Ê	L	I	M	T	E	J
S	O	Z	D	A	R	S	Ê	G	O	Ş	E
L	I	B	E	R	X	W	E	D	A	N	Î
Z	Ê	R	Î	N	I	R	E	Ş	B	Û	N
A	F	I	R	A	N	D	I	N	B	O	Z
Ê	K	U	R	D	I	S	T	A	N	A	Ş
B	I	R	Ê	V	E	B	I	R	R	O	J

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	C	O	M	E	R	D	■	B	A
2	A	D	A	R	■	A	M	A	R
3	N	E	D	Î	T	■	A	R	D
4	D	■	■	B	A	Z	■	Û	Û
5	A	Z	A	■	■	B	E	D	■
6	R	E	M	E	D	A	N	■	Ê
7	■	R	Û	N	I	Ş	T	I	N
8	E	■	R	O	Z	■	A	R	■
9	M	E	■	B	Î	R	B	I	R